


# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)

K S S E  
C/O Asad  
P.F.301 503  
1000 Berlin 30



## PÎROZBAYÎ BI HATINA SERSALÊ

Xwendevanên hêja!

Komela me, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa, we tevan ji dil û can bi hatina Sersala Nuh pîrozdike.

Sala 1981 an vaye tête dawîkirin, saleke nuh destpêdike; miletê Kurd li herçar perçên Kurdistanê hêjî bê pişk û parin, nebes tenê ji mafeyê xwenî Milî hêjî bêtir ji mafeyê xwenî Mirovaniyê.

Li Kurdistana Turkî : Generalên diktatorên Turkî bi hezaran xort û keçên Kurdistan avêtin zindanan û bi sedan dan darvekirin, herwehaji bi hezaran demokrat li seranserî Turkiyê. Ev Generalên han nebes dijminên Miletê Kurd in, herwehaji ewana dijminên Miletê Turk bixwene, wan Turkî kirne wargeha Impiryalizma Emerîkî dijî xebata azadixwazî Kurd û demokratî Turkiyê û herwehaji dijî xebata miletên Rojhilata Navîn. Bêtir ji 32 wargehên leşkerî li Kurdistanê çêkirne, ku ewana jibona bercewendî û peimana Nato bixwene.

Miletê Kurd li Kurdistana Turkiyê tev li van diwariyên han ku bi destên Generalê Toraniyên Turkiyê di vê salê de hatine serê Miletê me, tev li wê jî, Miletê Kurd xebatê gerdike dijî wan, ligel demokratên Turk û yên Kêmaniyên Miletên din li Turkiyê, ji bona demokrasiyê li seranserî Turkî û gihandina Miletê Kurd bonî mafeyê xwenî dad.

Li Kurdistana Iranê: Miletê Kurd xebatê dike jibona gihandina mafeyê xwenî milî û çarekirina wêna bi sêweyekî asitî, jiber çarekirina mafeyê miletê Kurd li Kurdistana Iranê bi sêweyekî asitî ne bitenê berjiwendî û qezenca Miletê Kurd têde heye, herwehaji berjiwendî û qezenca hemû Miletên Iranê û biserketina Soresa Iranê beramberî Impiryalizma Emerîkî û kevneperestiyê têde heye. Cê xebata Kurd li Kurdistana Iranê di nav hêz û rêzên soresgêrên Iran de ye, jiber soresa Iran gewretirîn keleşa Impiryalizma Emerîkî li Rojhilata Navîn rixwând û ala xebat û têkoşînê dijî Impiryalizm û kevneperestiyê li heremê berz û bala kir. Cihê serûştî xebata miletê Kurd ligel Soresa Iranê ye. Her Kurdekî dilsoz di vê rastiya mêjûî de negihê û bixwaze xebata Miletê Kurd têxe benda Impiryalîstiyê û kevneperestiyê, têxe benda Sedam, Palîzman, Bextiyar û Ūweîsî, bêgotine bi ziyana Miletê Kurd û bi qezenca Impiryalizm û Kevneperestiyê tête dawîkirin.

Rojekê ji rojan ne xebata Miletê Kurd û neji xebata miletekî din li Cîhanê bi alîkariya Impiryalîzm û kevneperestiyê gihaye mafeyê xwe.

Li Kurdîstana Sûriyê : Miletê me hêjî xebatê dike, ligel hêzên demokrat û pêşverû, dijî Impiryalîzm, kevneperestiyê û Siyonîzmê û herwehaji jibona hilanîna Kembera Erebi, qanûna cinsiyê ya jirêderketî ya sala 1962, û jibona bicîanîna mafeyê xwenî milî, siyasî û civakî . Em bangî hêzên demokrat li Sûriyê û Hafîz El Esed - Serokê Komara Sûrî - dikin jibona hilanîna van qanûnên jirêderketî û pêrûnistina mafeyê miletê menî milî dad li Sûriyê, jiber evaya xurtkirna Komara Sûrî û berjiwendî û qezenca wê bixwe têde heye beramberî Impiryalîzma Emerîkî, kevneperestiyê û Siyonîzme.

Li Kurdîstana Iraqê : Miletê Kurd xebateke dijwar di sala 1981 an de beramberî rejîma Sedamî faşîst dikir. Bi hezaran Pêşmergeên Kurdistan daketin qada xebatê jibo Cenga Welêt li seranserî Kurdistan, jibona rixwandina rejîma Sedam yê xwînmiy û xwînwar, jibona demokrasiyê ji Iraq re û autonomî ji Kurdistan re.

Miletê Kurd li Kurdîstana Iraq dest bi dest birayê xwenî Erebi û Kêmaniyên milî yên din li Iraqê xebatdikirin jibona pêkanîna Bereki nîstimanî demokrasî giştî li Iraq, jiber di riya vî Berî de destana Iraqê tê dawîkirin, jiber rejîma Iraq ne bitenha Kurdistan talan û wêrandike herwehaji Iraq bicarekê ber bi wêrankirinê dajo.

Ji 22.9.1980 an de rejîma Sedam cengek dirindane li ser Komara Iranî Islam vexistiye; divê cenga han de bi hezaran lawên Kurd û Erebi bi xorayî dide kustin û wehaji bi hezaran lawên Iranî tene kustin, ku di vê cenga han de bitenha qezenca Impiryalîzma Emerîkî û kevneperestiyê heye. Sedam ev cenga han pêxist jiber ew nokerê Impiryalîzma Emerîkî bixweye, lê vaye roj bi roj leşkerên wî tene şikandin û Iran dibe goristan jibonî leşkerên Sedam yê faşîst. Hêzên demokrat û pêşverû seranserî Iraqê ala xebatê dijî rejîma Sedam berz û bilindkirne û ruxandina wê vaye ji herkesî re, roj bi roj, diyar û eşkeretir dibe.

Em bangî hemû hêzên demokrat û pêşverû li seranserî Iraq û Kurdistan dikin jibona destên xwe têxin nava destên hev bi dostanî û biratî di Bereki Nîstimanî Demokratî Iraqî Giştî de, ku bi lez û bez rejîma Baasî Faşî birûxinin, (Desthilatiyeke Demokratî Ligelhev) pêkbînin û Autonomiyek rast û durîst jibona Kurdistan bicîbînin.

Komela Xwendekarê Kurd li Ewropa bangî hemû Xwendekarên Kurd li Ewropa dike jibo destên xwe têxne nava destên hev ligel hev din xebatê bikin, û roj bi roj bêtir Miletê Kurd û rewşa Kurdistanê bi miletê Cîhanê bidin naskirin, herwehaji xebata xwe ligel hemû hêzên demokrat û pêşverû li cîhanê, dijî Impiryalîzm û kevneperestiyê, gûr û geşbikin, û pêre ji dostaniyê û Aşitiyê li Cîhanê xurtbikin.

Em bi hatina Sersala Nuh hemû Endamên xwe û Miletê Kurd û Hemû Mirovaniyê pîrozdikin, û hêviya Aşitiyê û Bextiyariyê jibona wan dikin.

K S S E

Komîta Birêveberî Giştî

1.1.1982